



Derketin






Published by the Comic Bible Society, LLC
Copyright © 2021

Kingstone Comics maintains copyright to
this comic book as provided by United
States copyright law.

Print and digital copies of this version may
be freely distributed without penalty under
a Creative Commons license.



Gel pê rêberiya Xwedê şopandin û çûn heta ku ew hilkişîn çiyayan û li pêşiya Derya ya Sor gihîştin. Çaxê wan gotûbêj kirin ka ew ê çawa derbasî avekê mezin bibin wan li wê derê kon vedan.



Piştî ku Firewn ji bo zarokê xwe şîn girt, hêrsa wî ji berê germtir û bi şewat bû. Wî çima koleyên xwe wiha hişt?





Dema ku yê Mîsrî yê İbrani bēçare dîtî û êşa ku Mûsa ji Mîsrê re çêkir anîn bîra xwe, ew baş amade bûn ku pêş ve biçin û wan bikujin.



De binêrin, va ye leşkerê Mîsrî li pey me tê! Em li vê beriyê de asê mane!

Mûsa em deranîn û anîn li vir ku em **bimirin**. Çêtir bû ji mirina li vê derê yê Xwedê-terikandî me wekî **koleyên** bijiya.



Çiya li der û dora me ne û av jî li ber me ye. Em hatine **asêkirin**.

Tu tişt tune ku Xwedê bike ku me niha xilas bike.

Li cihê xwe bisekinin. **Wê** Xwedê me bi awayekî xurt û bihêz rizgar bike.

Xwedê careke din dilê Firewn hişk kir. Piştî îro hûn ê leşkerê Mîsrî **tu caran** nebinin.





Ji bo tolhildana belayan û wêraniya ku bi ser
Misrê ve hatin, artêşa Misrî, 600 ji erebeyên şer
ên Firewn û komeke ji erebeyên din dan ber
Îbraniyan ku hemûyan qir bikin û bikujin.



Gelo li Misrê tu
gor tune bûn?

Me ji te re got –
Dev ji me berde,
bila em ji Misriyan
re xulamîyê
bikin!

Wê ji
mirina bi şûr
çêtir ba!

Qayîm û xurt
bisekinin û
rizgarkirina ku wê
Xudan ji we re
bine bibînin.






Tevahiya şevê ewr aliyekî dikir tarî û aliyê
din dikir ronahî. Loma seranserê şevê
herdu alî nêzikî hev nebûn.



Gopalê xwe rake û destê
xwe dirêjî ser deryayê bike,
wê bibe du şeq û wê Îsraîlî di
nav deryayê de, li ser
erdê ziwa bimeşin.

Û Xudan bayekî
rojhilatî û xurt rakir...

Ez ê li ber Firewn û
erebeyên wî yên şer û
siwarên wî rûmetdar bim...
Û wê Misrî bizanibin
ku Xudan ez im!







Ev çî tiştên
ku me li Misrê
dîtin dixê.

Hêl hêl!
Xwedayê me
ji hemûyan
Xwedayê herî baş e!
Em di nivê deryayê
de ne.



Yoşiya!
Ma tu dîn û bêaqîl î?
De ji vir here û dûr
keve! Tu dizanî tu
nikarî avjeniyê bikî!

Ez tenê
dixwazim destê
xwe bidim
masiyê spehî û
xweşik.



De pêş ve herin,
Îbraniyan bikujin!



Çaxê Îbraniyan hema hema li aliyê
dîn bûn, Xwedê dîwarê êgir ê ku Misriyan
li paş xwe hiştibûn vekîşand.
Ew li pey Îbraniyan bazdan.



Îro we hêza
Xudan dît.

Va ye av bi
şûn de dizivire.

Ew ê bi tevahî
di bin avê deryayê
de bixeniqin û
bifetisin.



Her yek ji artêşa Misrî di deryayê de mir. Îlahên
wan ên ji darê û kevir nikarîn wan xilas bikiran.



Tevahiya arteşa
Misrî... nefilitî.

Stranan ji Xudan
re bêjin, çimkî
ew gelekî berz e.

Wî hesp û siwar
avêtin deryayê!



Gelê Îsraîlê di beriyê re şê
rojan meşyan û tu av nedîtîn.

Av tehl e -
Em nikarin
wê vexwin.

Lê Xudan perçê darekê nîşanî Mûsa da.
Mûsa wî perçî avêt nav avê û av jî şêrîn bû.



Xwezî me li Misrê
bimiriya. Qet nebe me
li wir têra xwe dixwar!

Hûn ne li dijî
min lê li dijî
Xwedê gazin
dikin.



Ji gel re bêje, ez ê
her roj ji ezmanan nên
bibaînim.



Va ye wek ku
Mûsa got, nan ji
ezmên barî.

Gelo çima
me şik û
guman kir?

Ox,
çiqas xweş e!
Tehma wî wekî
hingivê ye.



Di dema ku ew li beriyê de bûn, Xwedê
Manna bi ser wan de barand.



Di dema ku ewr li ser artêşgeha
wan sekinî, Îbranî li cihê xwe man,
lê gava ewr dest bi livandinê kir,
wan konên xwe dan hev û li pey
wî çûn beriya nenas.



Lê demek hat ku ava wan xilas bû.

Gelo Xwedê bi
me re ye an na?

Va ye ez ê
biçim bi Xudan
re bipeyivim.



Bi gopalê xwe li zinarê
li çiyayê Horêvê bixe, wê jê
av ji gel re biherike.



Hûn şik û
gazinan dikin. De werin
binêrin Xwedê dikare
çî ji vî zinarê bêber
bîne!




Weeeeex!

Mûsa navê vê derê Massa ("Ceribandin") û Merîva
("Devjeniyê") danî, çimkî Îsraîlî devjenî kir û Xudan
ceribandin bi gotina: "Gelo Xudan bi me re ye an na?"

Av mîna
çemekî herikî.



Lê av ne pirsgrêka
wan a tenê bû...



Hele binêrin -
a li wir li çolê.

Amalêqî...

Hele bila yek
bibeze û ji Mûsa
re bêje.



Ew difikirin
ku me li vir
asê kirine.

Yêşû, hin zilmên
xwe yên herî baş
hilbijêre û herin bi
wan re şer bikin.

Sibê, ez ê gopalê Xwedê
di destê xwe de li serê
gir bisekinim.



Em dikarin ji vir
tevahiya şer bibinin...
û tu dikarî xwe bidî
ber gelê Xwedê.



Lê piştî demekê
Mûsa westî û
destên wî daketin.



Her ku milên wî
dadiketin Amelêqî bi
ser diketin...



Û Xwedê ji bo têkbirina Amelêqîyan duaya Mûsa anî cih.

Mûsa berê di dema tekoşîna bi Firewn re de jina xwe û du kurên xwe şandibû ku bi xezûrê wî, Yîtroyê, re bijîn, lê niha ew vegeeriyên.

Bavo!

Dawîya dawiyê, malbata min tevî min bû.

Te tiştê ku ji tevahiya xezîneya Misrê bihatir e ji min re anî.

Wek ku Mûsa ji bo vegera malbata xwe dîlşa bû, wî ji Yêtroyê re her tiştê ku Xwedê di rizgarkirina wan ji destê Misriyan de kiribû got.

Niha ez **dizanim** ku Xudan ji hemû îlahan mezintir e, bi taybetî bi quretiya ku wan li Îsraîliyan dîkir.



Dotira rojê Mûsa ji bo ku li dozên
gel binêre bi wan re rûnişt.



Ev çima tu ji
bo gel wiha dikî?

Gel tê ba
min ji bo ku bi
daxwaza Xwedê
bizane.

Ya ku tu dikî wê te
tenê biwestîne --
Tu nikarî bi tena serê xwe
ji heqê vî karî derkevi.



Divê tu ji dêla
gel ve li ber Xwedê
bisekinî.

Qanûn û şerîetan
hînî wan bike û rêya
ku wê lê herin nîşanî
wan bide.

Mirovên
Xwedêtirs ku dadgeriyê
bikin hîlbijêre û tayîn bike, lê bila
ew dozên mezin bînin pêşberî te.



Bi vî awayî **tê**
bikaribî teşxelayê
çareser biki, û wê
gel jî razî bibe û bi
aşti here mala
xwe...

...û ser de wê
keç û neviyên
min demeke
xweş û dirêj bi
te re derbas
bikin.

Tevî ku ew serokê miletekî mezin bû,
Mûsa guhê xwe da şîreta xezûrê xwe.

Îcar divê em ewqas
li benda biryarekê
nemînin.

Mirovên
bikêrhatî yên ku
min hilbijartin jî
dadgeriyê baş
dikin...



Bê guman Xudanê
karîndar di nav we
de ye.

Gelek
spas ji te re,
hevalê min
ê dilsoz.

Û Mûsa xezûrê xwe bi aştî bi
rê kir ku bizivire welatê xwe.



Bîne bîra wan ka min
bi Misriyan kir, min çawa
wan xilas kir, tê kir û min jî
zinarekî avê da wan.

Careke din ewr liyivî û yê Ûbraîî jî tiştên xwe dan ber
hev û bar kirin û pê wî ewrî ber bi beriyê ve çûn û li
pêşberî çîyayekî ku bi navê Sînayê dihat nasîn sekinîn.



Heger ew guh bidin
emrên min, ew ê di nav hemû
gelên din ên li ser rûyê erdê
bibin gelê min ê taybet û hêja.
Û ew ê herwiha bibin
padîşahiya kahinan.

Mûsa, gava ez bi te
re bipeyvim, ez ê di nav
ewrekî tarî de bêm da
ku gel bizanibe ku
ew ez im.

Îsraîlî, piştî ji Misrê derketin sê meh paşê gihîştin beriya Sînayê.



Û ew li beriyê, li pêşberî Çiyê kon vedan û bi cih bûn.

Wê hingê Mûsa derket ber Xwedê û Xudan ji çiyê deng lê kir.



We dît ku min li Misrê çî kir, û min çawa we li ser baskê teyrên baz hilda û anîn ba xwe.

Îcar heger hûn bi tevahî guh bidin min û bi peyman min ve girêdayî bimînin, hingê hûn ê ji nav hemû miletan bibin milk û xwediyê min ê hêja.

Mûsa ji çiyê daket û her tiştê ku Xwedê lê emir kiribû ji gel re got.

Her tiştê ku Xudan gotiye em ê bikin.

Îcar biçin, kincên xwe û xwe bişon û pak bikin; xwe amade bikin ku biperizin Xwedê. Sê roj şûnda wê Xwedê li ber we dakeve û serdana we bike.

Çawa ku Xwedê emir dabû, di roja sîsiyan de hemû gel li ber çiyê civiyan ku li benda Xwedê û gotina wî bisekinin. Ewrekî giran û tarî ser çiyê girt û dîv re...

Mûsa, de rabe were serê çiyê.

Ez Xwedayê Karîndar im ku tu ji Welatê Misrê deranî. Çaxê tu dakevî jêr, sînorekî li dora vê çiyê bikişîne.

Heger yek ji gel destê xwe bide vî çiyayî ew ê bimire. Ez ê deh emiran bidim te ku divê tu ji gel re bêjî.



Wê ji min pêve tu
îlahên din tune bin.

Ji xwe re tu pût çeneke.

Navê Xwedê vala
neyne ser zîmanê xwe.

Roja Septê bibîr
bine û pîroz bihesibîne.

Qedrê dê û bavê xwe bigire.

Nekuje.

Zinayê neke.

Diziyê neke.

Lî dijî kesên din tu
şahiya derewin neke.

Çav bernede mal û
milkê kesekî din.

Xwedê di heman demê de rê û rêbazên ku dadperwerî ji hemû mirovan re saz kirin da Mûsa.

Birîna kesane:

"Kesê li kesekî din bixe û bikuje, divê ew jî bê guman were kuştin."

"Lêbelê heger ew bi qestî nekiribe, ew ê bikaribe bireve cihekî ku ez ê jê re kifş bikim."

Berpirsiyariya civakî:

"Tu neheqî li tu jinebî û sêwîyan neke."

Parastina mal û milkan:

"Gava kesek ga yan pezekê bidize û wî serjê bike yan bifiroşe, wê diz di şûna gayekî de pênc gayan, di şûna pezekê de çar pezan bide."

Tê zordariya xerîban nekî û wan nexî tengasiyê, çimkî hûn jî li welatê Misrê xerîb bûn.

"Di dozêkê de heqê hejaran nede xwarin."

"Tê jî bo xerabiyê li pey qelebalixê nekevî."

Ji ber ku Xwedê pîroz bû, wî rê û
rêbazan jî da gel ku çawa bîperizin wî...



Tenê golikek
saxlem û
bêqisûr pêşkêş
bikin.



Zeyt û bixûrê
bikin ser wî qurbanî...
Ew bêhnêk xweş e
ku kêfa Xudan tîne.

Xwedê emir da ku
wan sax bihêle.



Dî roja heştan
de wê lawik bê
sinetkirin.



Divê ew xwe
dûr bixe.

Mû spî bûne û çerm
xav e - Ew nexweşîyeke
çerman û herdemî ye.



Hûn ê rojên min
ên Septê bigirin û
rûmetê ji Pîrozgeha
min re nîşan bidin.
Xudan ez im.

Hûn ê ferq û
meyliya belengaz û
hêzdarên nekin,
lê cîranê xwe rast
dadbar bikin.



Pîroz be,
çimkî ez,
Xudan Xwedayê we,
pîroz im.

Mûsa ji çiyê daket û emirên Xwedê ji heftê rîspiyên Îsraîlî re gotin.

Ew emirên baş û qenc in.

Mûsa her tiştî wêk ku Xwedê jê re gotibû nivîsî. Ruhê Xwedê alîkariya wî kir ku tu şaşî û xeletiyên neke.

Xwedê emir da Mûsa ku qurbanek pêşkêş bike.

Hemû gunehkar bûn, hêjayî mirinê bûn, lê Xwedê dîlovan û birehm bû.

Wî rêya revê peyda kir. Bi serjêkirina berxekî bêguneh û bi reşandina xwîn li ser millet, wê Xwedê li gunehên wan biniximîne û bibexşîne.

Gava Mûsa karê xwe anî dawiyê, wî gel li hev civand û gotinên Xwedê ji wan re xwend.

Her tiştê ku Xwedê gotiyê baş e û em ê guhê xwe bidinê.

Îcar milletê Îsraîlî bi Xwedê re peyman çêkir. Wê Xwedê wan pîroz bike, jiyan bide wan û wan ji dijminên wan xilas bike, û wê Îsraîlî ji aliyê xwe bi meşîna li rêya rastdariyê guhdariya hemû emirên wî bikin.

Niha jî gunehên we nixumandî ne, hûn, heftê rîspî, bi min re hilkişin serê çiyê û hûn ê li wir rûmeta Xwedê bibînin.

Îcar, heftê rîspiyên Îsraîlî pey Mûsa hilkişyan
çiyê ku Xwedê li wir bi Mûsa re peyivî.

Ji nişka ve li pêşya wan
textê Xwedê xuya bû.

Rûmeta
Xwedê!

Xwedê gazî Mûsa û Yêşû kir
ku bi wî re li ser çiyê bin.

De li vir
bisekinin heta
ku em vegerin.

Harûn û Hûr bi
we re ne û her kesê
ku meseleye xwe
hebe dikare here
ba wan.

Ji gelê li jêr rûmeta Xwedê li ser Çiyayê
Sînayê mîna agirekî bi şewat xuya dikir.

Mûsa çil şev û çil rojan li serê çiyê ma.



Bila gel konekî
hevdtîne ava bike ku
tê de biperize min.
Wê di nav de gorîgeheke
qurbanan û ciheke pîroz
hebin ku ez ê salê carekê
bi serokkahin re
hevdtîne bikim.

Ez ê ji te re bêjim ka çawa
konê hevdtîne tê avakirin.
Wê eşîra Lêwî bibin kahînen min.
Ew ê jî hînî gel bikin ku li gorî
qanûnen min bimeşe, û dema
ku gel guneh bike bila ew
qurbanan pêşkêş bikin.



Xwedê du lewheyên kevirîn
ku li ser bi tiliya xwe wan deh
emiran nivîsibûn dan Mûsa.



Mûsa bû **hefteyan**
di wî agirê wî çiyayê
de winda bû ye.
Ew niha bêguman
mirî ye.

Em nikarin li
vê beriyê heta
hetayê bimînin.

Em hewceyê
îlahekî ne ku li pêşiya
me wekî Mûsa be û
me bi rê ve bibe.



Harûn bi daxwazên gel re çû û alîkariya wan kir ku îlahekî zêrîn çêke.



Va ye Xwedayê we yê ku
we ji welatê Misrê deranî.
Sibê em ê cejneke pêşkêş
bikin û ji Xudan re biperizin.

Harûn dizanibû ku ew nîgar ne îlahekî ye, lê ew ji gel ditirsiya.



Gel qurbanên şewitandî pêşkêşî
golikê kirin û bi vexwarin û bi kêf
û şahiyê mijûl bûn.*

Xwedê bi Mûsa re peyivî û got, "Hele rabe berjêr be!
Gel gunehê mezinê kirin. Wan li ber pûtê perizin.
Divê ez wan hemûyan tune bikim. Dilê wan hişk e.
Ew bi rastdariyê rêve naçin."

*Di perzîna pûtê golikî de,
Îsraîlî sê emrên pêşin ên ku
Xwedê dabû wan şikandin.



Dengê şer ji
artêşgehê tê!

Ne dengê
serketiyên e, ne jî
dengê têkçûyîyan e.
Ew dengê stranên e.



We emrên
Xwedê şikandin!



Mûsa lewheyên kevirîn
ên ku emir li ser hatibûn
nivîsîn şikandin.



Ma wî negot ku **tu îlahên
dîn** berî wî tune bin? Ma dibe
pûtekî ku hûn bi destên xwe
çêdikin bibe afirînerê we?

Mûsa golikê zêrîn şewitand,
kir xwelî, bi ser avê de rêşand
û bi gelê Îsrâil da vexwerin.



Vî geli çi bi
te kir ku te ev
gunehê mezin
bi serê wan
de anî?

Hêrs nebe -
tu dizanî ev
gel çi komeke
xerab e.



Em, Lêwîyan,
em ê li pey
Yahweh biçin

Heger tu li aliyê Xwedê yî,
de were bi min re bisekine.
Heger tê ji îlahên Misrê re
perzînê bikî, li cihê ku
tu lê yî bimîne.

Niha jî şûrê xwe li
pişta xwe girê bidin û
her kesên ku wêneyan
diperizin bikujin.



Wê rojê 3000
kes hatin kuştin.



Bikujie

Naaa!

Aaaa!



Mûsa hilkişî çiyê û careke din Xwedê deh emir li ser du lewheyên kevirîn nivîsandin.



Gava we guneh kir, Xwedê ji min re got ku ew ê we tevda bikuje, lê min ji bo we lava kir û ew ê gunehê we bibexşîne. Ew bi rastî dilovan û bêhnfireh e.



Wê Lêwî her roj qurbanên xwînê pêşkêş bikin. Salê carekê, wê xwîn li ser Sindoqa Peymanê were danîn. Dema ku Xwedê xwîn li ser Sindoqê bibîne, ew ê gunehên me bibexşîne û em ê nemirin. Ew rêya bexşandina Xwedê ye.

Xwedê rê û rêbazên avakirina konekî hevdtîninê dayê min. Ew ê li wir bi me re bicive. Ji ber ku em hemû gunehkar in, Xwedê rêyek amade kiriye ku em pê nêzik bibin.

Konê Hevdtîninê hat avakirin û kahin dest pê bi pêşkêşkirina qurbanên rojane kirin. Çaxê Xwedê baweriya wan dît, wî gunehên wan bexişandin.



Tevî hemû tiştên ku Xwedê li Çiyayê Sînayê kir gel dest bi gilî û gazinan di derheqa zehmetiyên xwe de kir.

Ev çi soz e ku wê Xudan Xwedê bi me re here.

Em qet nizanin em ê kengî avê bistînin – Dibe ku di nêz de hemû laşên me li ser rûyê vê çolê ya bê-Xwedê bimînin.



... me qet tu...ne...

Aaaax!
Agir! Hele gazî Mûsa bikin!

Mûsa, Mûsa – were me xilas bike! Agir ji ezmên li ser artêşgeha me de dikeve!



Gava Mûsa lavayî Xudan kir, agir tefiya, lê ji ber gilî û gazinên gel dora artêşgehê hat şewitandin.



Û wê derê bi navê Tavêra (Agir) hate naskirin.



Hinekan dest bi gilî û gazinan li ser xwarina ku Xwedê bi keremeta xwe peyda kir kirin.

Min têra xwe manna xwar û ji xeynî wê em tu tiştî nabinin.

Her roj heman tişt e.



Gel ew berhev kir, xiste nav êrd, ew kelandin, û dûv re jê narpêj çêkirin — Tehma wan wek tehma kêkên ku di zeyta sebzeyî de hatine qewirandin.¹

¹ Bi şev manna bi xunavê re ket erdê.



Ox ox!
Ew masiyên tehmîxwêş ên ku me li Mîsrê pir dixwarin hatin bîra me.

Û ew xiyar, zebeş, pîrasa, pîvaz û sîrên ên xwêş û bîtehm!
Lê niha daxwaza xwarinê li ba me nemaye, û roj bi roj divê em ji xeynî mannê em tiştêkî naxwin!

Mûsa bihîst gel li ber konê xwe gilî û gazinan dike, û ew pir nerazî bû û li ber xwe ket.

...Lê Xwedê ji hêrsa xwe germ bû.



Min çî kir ku dilê te
bi min ne xweş e û te
barê vî gelî wiha
da piştî min?

Ma ew zarokên
min in? Ma ez
bavê wan im?



Divê ez wan
mîna zarokên berşîr
hilgirim heta ku em
bigihîjin Axa
Sozdâyî?



Ez nikarim bi tena
serê xwe vî gelî ragirim!
Bar pir û pir giran e!


Heger tê bi vî
awayî bi min re bidî û
bistinî, ji kerema xwe
yekser min bikuje.



De here û heftê serok
û rêberên Îsraîlî li pêşiya
min bicivîne û bi xwe re
bîne Konê Hevdîtînê.
Ez ê dakevim û li wir
bi te re bipeyivim.



Ez ê ji Ruhê ku
li ser te ye hilînim
û bidim wan jî...



... Ji bo ku tu
bi tenê wê barê
hilnegirî.



De here ji gel re
bêje ku xwe paqij û
pîroz bikin - ji bo sibê
wê goşt bixwin.

Ji wan re bêje ku
min hemû giliyên
wan bihîst.

Ew ê wî bixwin,
ne rojek, du roj, pênc roj,
deh roj an bîst rojan!

Ew ê tevahiya mehekê
goşt bixwin, heta ku ji
pozê wan wî vereşin!
Çimkî ew Xudanê di nav
we de li vir e red kirin.




600,000 zilam
hene, ji xeynî jin û
zarokan - û hê jî tu soz
didî wan ku ew ê tevahiya
mehê goşt bixwin!



Heger em hemû
pez û dewarên
xwe serjê bikin,
wê têra wan
neke!



Divê em tevahiya
masiyên deryayê
bigirin da ku em soza
te bi cih binin!



Ma kengê ez
lawaz bûme?

Tê niha bibînî
ka tiştê min ji te
re got pêk tê
yan na.

Piştî ku Mûsa hemû tişt ji gel re got,
wî heftê rîspî civandin.



Û Xudan Ruhê ku li ser Mûsa bû hilda û da heftê rîspiyên li wir.



Û gava ew Ruh standin, ew pêxemberî kirin jî,
piştî careke din nekirin.

Li artêşgehê du zilam mabûn û gava
Ruh hat ser wan, li wir pêxemberî kirin.

Divê ez vê
yekê ji Mûsa re
ragihînim.



Wan her du zilaman
pêxemberitî dikirin, tevî
ku ew ne bi we re bûn.

Ma tu
ji bo min
didexisî?

Xwezî tevahiya
gelê Xudan
pêxember bûya û
Xudan Ruhê xwe
daniya ser wan
hemûyan!



Wê şevê Xudan bayekê rakir û ji deryayê sûsik anîn.



Bi qasî rêveçûna rojekê dûr sûsik nizam difiriyan.

Gelek sûsik hebûn û kesê herî kêr civand, deh omer (kêr zêde 2200 lître) da hev.



Dawiya dawiyê -
goşt!

Ez nikarim
hê bisekinim
ku vê
bipijînim!

Navê wê derê Qîvrot-Hattaawa ("Gorên Iştahê,") danîn çimkî wan li wir kesên ku dilçûna wan ji bo goşt û ji bo Mîsrê rabûbû li wê derê veşartin.

Û ji wê derê ew koçî Hasêrotê kirin, ku ew li wir hinekî man.

Lê gava gel hê goşt dixwarin hêrsa Xudan li dijî wan rabû û wî gelek bi bela kuştin.





"THE BIBLE EXPLAINED
IN EVERY LANGUAGE."



SUPERBIBLE.TV